Delikaya, Ö. (2016). Berxwedan û şahidî; hêmanên sereke yên salên 90î di çîroka Berbang jî Şahid e ya A. Çeko Jiyan de. Wêje û Rexne, (7), 136–149.

ÖMER DELİKAYA

# BERXWEDAN Û ŞAHIDÎ; HÊMANÊN SEREKE YÊN SALÊN 90Î DI ÇÎROKA *BERBANG JÎ ŞAHID E* YA A. ÇEKO JIYAN DE

*"Mamosteyê wê yê li Oklahomayê ketibû bîra wê, wî di derbarê xebata mafê mirovan ya li Kurdistanê de gotibû: Gundek dikare li ser navê pir gundan xeber bide, mexdûrek dikare li ser navê pir mexdûran xeber bide."*[1]

**Pêşekî**

Têkilîya edebîyat û polîtîkayê ya ku bi rehetî nikare bê înkarkirin, bi awayekî berçav xwe dide der di reng û rûyê çîroksazîya kurdî de. Jixwe, hemû edebîyatên dinyayê dema ku hewla werara xwe didin, bivê-nevê çepilên wan di astên cuda de –vegêr, şexsibûna vegêranê, teşegirtina fahma nivîskar û hwd.- tên li çeperên polîtîkayê diqelibin. Qesta me ji polîtîkayê ne bi bergeha teng a nêrîtî ye ku bi piranî jê partîzanîya hişk, hewla veguhastina fikrên polîtîk û sîyasetvanan tê fahmkirin. Nivîskar an jî bi navê xwe yê di deqê de, *vegêr* ku têkilîya di navbera nivîskar û xwendevan de çêdike[2], helbet wekî endamekî/ê civakê nikare xwe ji tesîr û biryarên sîyasî yên civakê bifilitîne. Wihareng jî, nivîskarê kurd an jî bi nêrîneke giştî edebîyata kurdî ku di rêvitîya xwe de wekî çemekî xwedîyê pir çivanekan e, ji edebîyata li Qefqasyayê heta qonaxa Hawarê

1 **Epîgraf:** Ondatje, Michael (2011), *Anil's Ghost*, weş. Vintage, London, r.170.
2 Alan, Remezan (2015), *Zanista Edebiyata Modern*, weş. Peywend, Stenbol, r.117.

bi dînamîkên polîtîk ve serencama xwe berdewam kiriye û bi berxwedana xwe ve heta roja me hatîye.[3]

Nivîskarên kurd ên ku di salên 90î de yan jî salên berî 90î de koçî Ewropayê nekirine û lê xebitîne li welêt bimînin ku pareke wan a mezin niştecihên Amed, Mêrdîn û dormalê van bajaran e, şahidîya rasterast a li şîddeta dewletê tecrûbe kirine û lewma tesîr ji qewimînên kavilker ên rojên qîr û qîyametê girtine ku wê demê vê yekê tehrîbateke mezin li ser civakê jî çêdikir. Vî nifşî digel tahdeyan, berovajî nifşê Ewropayê ku mirov dikare di bin sernavê sirgûnê de binirxîne, temayên xwe zêdetir bi êşa kesên li welêt ve girêdane. Helwesta nivîskarên li welêt derfeta vegotina şahidîya bûyerên salên 90î daye wan û wan rengekî serborîya takekesî daye deqên van nivîskaran. *Lal Laleş, Selahattin Bulut, Îrfan Amîda, Arjen Arî, A. Çeko Jiyan, Omer Dilsoz, Dilawer Zeraq* û bi dehan kesên din ji ber ku li welêt emir kirin/dikin, bivê nevê barê şahidîyê didin li ser milên xwe. Wate, ji ber ku bûyer û karesatên li welêt rû didin, li ber çavê nivîskarên kurd pêk tên, nivîskar atmosfera xerab a welêt tecrûbe dike û şahidîyê lê dike.

Berî her tiştî, divê bê bibîrxistin ku çîrokên ku bi vegotina bûyerên salên 90î ji xwe re kirine babetên sereke, bi berfirehî xwe dispêrin şahidîyê; nivîskar bi xwe wekî niştecihê welatê xwe govanîyê li zilm û zordarîyê dike ku li dormaleya wî/wê rû dide; heta dereceyekî çîroksazîya ku ew hewla afirandina wê de ye di heman demê de gefek e bo desthilatdarîyê. Lewma edebîyata kurdî ji ber ku ji desthilatdarîyê gef xwar, xwe li dijberî gef û qedexeyên li ser çand û ziman kete kozika berxwedanê. Harlow di berhema xwe ya navdar a bi navê *Ressitance Literature* (Edebîyata Berxwedanê) de dibêje ku di pêwenda edebîyatê de yekem car kesê ku têgeha *berxwedan*ê bi kar tîne nivîskar û aktîvîstê fîlîstînî Ghassan Kanafani ye.[4] Dema ku Harlow têgeha edebîyata berxwedanê pênase dike, dibêje ew “wekî çalakîyeke polîtîk an jî polîtîze balê dikişîne li ser xwe û bi piranî jî li ser edebîyatê. Edebîyata berxwedanê, tavilê û bi awayekî rasterast beşdarî berxwedanê dibe li dijî formên zal û serdest ên berhemdana îdeolojîk û çandî.”[5]Anegorî Scalbert-Yücel edebîyata kurmancî ya hevçerx gelek bi asayî dikeve nav pola edebîyata

3 Bo xwendineke zêdetir li ser berxwedana edebîyata kurmancî, binêre: Clémence Scalbert-Yücel, “Paratekst û Berxwedan di Pênaseya Edebiyata Kurmancî ya li Tirkiyeyê”, (amd.) Alan, Remezan & Öpengin, Ergin (2014), *Tîr û Armanc: Gotarên Rexneyî li ser Edebiyata Kurdî ya Modern*, weş. Peywend, Stenbol, r.71-86.

4 Harlow, Barbara (1978), *Resistance Literature*, Methuen Press, New York, 1987, r.2.

5 Harlow, Barbara, *b.n*, r.28-29.

berxwedanê: nivîsarên mîlîtan an çalak û edebîyateke dilsozê dozê, ku piştgirîya tevgera neteweyî ya kurd an jî, bi gotineke firehtir, a gelê kurd dikin.[6] Herwiha şahidîkirin perekî berfireh ê edebîyata kurdî dadigire. Nivîskar bi xwe ji nav bûyerê çîroka xwe qiset dike, dixwaze bûyera ku ew bi xwe wekî kirdeyekî tê de cih girtiye an jî bûye şahid veguhêzîne û herwisa naxwaze şahidîya wî/wê ya kambax xwebere winda bibe bêyî ku bîra civakî û hevpar de cih bigire. Ev midaxeleya bi van hizran ve tê ber bi deqê ve dikeve rê, ji alîyekî ve dil dike bi erkeke ku dişibe ya dîroknûsekî rabe da ku bo nifşên bê rabirdûya xwe ya nêzîk neqil bike ya ku bi gelemperî ji alîyê serdestan ve tê manîpulekirin, li milekî din ve jî dixwaze li hember şîddeta giştî kozika xwe ya hizrî û edebî bi rêya deqê ve xurt bike.

Salên 90î ku di heman demê de bo nivîskarên kurd pir zehmet bûn, pir nekişand bi hêma û temsîlên xwe ve bû mêvanê çîroksazîya (*fiction*) kurmancî û zazakî. Rengvedanên van salan ên di roman û kurteçîrokan de, beşeke edebîyata şahidîyê bo van salan dirist kir. Di dehan berhemên derheqê vê dewrê de, îşkence, valakirina gundan, zindan, failî mechûl, torosên spî û hwd. bûn tema û objeyên bingehîn ên beşeke vê edebîyatê.

Di vê gotarê de, hewlek heye ku dixwaze hêmayên salên 90î bi bergehekî edebîyata şahidî û berxwedanê ve bide ber ronîya çavan û pirtûka *Berbang jî Şahid e*[7] ya A. Çeko Jiyan li dor qewimandin û hêmanên sereke yên wan salan binirxîne. Herwiha, li ser navê çîroka bi navê *Berbang jî Şahid e* ya A. Çeko Jiyan, nirxandinên giştî derheqê edebîyata şahidî û berxwedanê de hatine kirin û çend hêmanên sereke yên çîroksazîya nivîskar bi vê bergehê hatine şîrovekirin. Di vê gotarê de dîsa hat dîtin ku nivîskarê ciwan A. Çeko Jiyan, bi honaka xwe ya serkeftî û bi zimanê xwe yê herikbar xwestîye temsîleke xweş a salên 90î bide ber xwendekarên xwe. Herwiha, nivîskar dengê kesên mexdûr, bi dengekî bilind li me dide bihîstin da ku em felaketên salên 90î bisitirînin di bîra xwe ya kavil de û bi vî rengî bo xwe dahatûyekê bisêwirînin.

### Paşxaneya Şîddetê

Salên 90î li Kurdistanê, ji gundan heta nava bajaran, ji tirsê heta

---

6 Scalbert-Yücel, Clémence, "Paratekst û Berxwedan di Pênaseya Edebiyata Kurmancî ya li Tirkiyeyê", (amd.) Alan, Remezan & Öpengin, Ergin, *Tîr û Armanc: Gotarên Rexneyî li ser Edebiyata Kurdî ya Modern*, weş. Peywend, Stenbol, 2014, r.71-86.

7 Di vê gotarê de, hemû jêgirtin ji vê pirtûkê ne: A. Çeko Jiyan (2014), *Berbang jî Şahid e*, weş. J&J.

koçberîyê, ji bêserûberkirinê heta bîrên asîdê, ji koçberîya bi darê zorê heta wêrankirina gundan tebeqeyên tundîyê dora kurdan pêçandibûn ji pir alîyan ve û vê yekê heta radeyeke bilind trawma, xizanî, belavbûna malbatan û guherîna mercên jîyanê derxist holê. Esas, ev şîddeta ku li ser civakê rû dida ne di wan salan de dest pê kiribû, ne jî piştî wan salan –xêncî navberekê- bi temamî rawestîya. Lêbelê ev tehribata ku li ser civakê rû dida bi şerê PKKê û dewletê ve gur bû. Jongerden di vê derbarê de dibêje:

> "Herêma Kurdistanê ya li Tirkîyeyê, bi xedarî ji pevçûnên çekdarî yên di navbera tevgera serhildêr, Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) û artêşa dewletê, Hêzên Çekdar ên Tirkîyeyê (TSK) de tesîr girtiye ku paramîlîter û cerdevanan jî di vî şerî de ligel artêşê bûn. Deverên Kurdistana li Tirkîyeyê nexasim bi rêya valakirin, wêrankirina gundan tesîr girtiye ku ji alîyê artêşa dewletê ve pêk dihat wekî beşeke ji kampanyaya kontragerîllayî ya di nîvê salên 1990î de8."

Wekî ferdekî civaka xwe ne mimkun bû ku nivîskar ji bûyerên kavilker ên van salan tesîr negire di rewşeke wiha aloz de. Jixwe nivîsandina kurdî ya nivîskar wê demê bi têra xwe helwesteke serhildêr bû û ji ber vê helwestê ew dibû aktorekî sîyasî di heman demê de. Çawa ku Şarman jî tîne zimên: "Jixwe li Bakurê Kurdistanê nivîskarî û berhemdayîna bi zimanê kurdî bi hewldaneke polîtîk ve dihate girêdan; wisa dihate dîtin. Qedexebûna zimanê kurdî, bi salan têkoşîna doza neteweyî, tunebûna komele û dezgehên zimên ev kar dikire para hewldanên şexsî."[9] Kesên bi karên rewşenbîrîyê re mijûl bûn, dema ku hewldanên xwe yên şexsî pêk dianîn, bivê-nevê ji ber rewşa wê demê ya awarte bi roleke polîtîk ve radibûn. Ji ber ku qedexeyan li hemû perên jîyanê pêçabûn û şîddeta ku hertim li ber çavan bû bi çend qaîdeyan berdewam dikir: desteserkirin, kuştinên bêhukim, îşkenceya girtîyan, qedexeyên li ser medyayê û girtin û kuştina rojnamevanan û şewitandina gundan. Li hember van tiştan nivîskarên kurd diketin hewldana afirandina gotareke (*discourse*) dijber. Bi gotina Sccalbert- Yücel:

> "...gelek kes ji bo govanîyê an jî şahidîkirinê dinivîsin, ji bo hiştina şopeke li dû xwe: da ku nifşên paştir bikarin bi dîroka kurdan bizanin. Gelek kes herwiha dinivîsin da ku gotarekê durist bikin li dijî gotara serdest a li Tirkiyeyê ya ku hebûna gelê kurd (tevî çand, dîrok û ziman, hd.) înkar dike.

8 Jongerden, Joost. "Under (Re)Construction: The State, the Production of ldentity, and the Countryside in the Kurdistan Region in Turkey", *AFTER CIVIL WAR Oivision, Reconstruction, and Reconciliation in Contemporary Europe* (Ed) Bill Kissane, r. 150.

9 Şarman, Mihemed, "Di Çîroka Kurdî de Nivîskarî", *Wêje û Rexne*, h. 1, sal: 2014, r. 39.

> Bi vî rengî, edebiyat dadigere meydanekê ku tê de dengên bindest dikarin xwe bidin bihîstin. Bi awayekî dîroka kurdan ji nû ve ava dike."10

Edebîyat, di rewşên felaketê de, bo bindestan dibe alavekî ku pê dengên bindest baştir tê bihîstin. Encamên wêranker ên ku zêdetir civaka bindest tesîr dike, bi gotina rast ji nava civakê derdikeve û bi destê desthilatdarîyê tê sepandin û li ser hizr û derûna civakê tehrîbatên nedîtî pêk tîne. Edkins vê derbarê de amaje pê dike ku "tişta ku em wekî trawmayê bi nav dikin bi vî rengî pêk tê; dema ku hêza zêde ya ku me bawerîya pê anîye ku wê me biparêze û ewlehîyê bide me dibe îşkencekarê me: dema civaka ku me xwe wekî endamekî wê dîtîye, dibe dijminê me yan jî malbata me êdî ne cihê penagehê ye berovajî vê cihê talûkeyê ye."[11]

Rewşeke bi vî karî helbet dê bi awayekî xurt cihê xwe bigire di bîra civakî de û bibe mijara sedan roman, kurteçîrok, şano, fîlm û qadên din ên hunerî. Em dikarin bi dilekî rihet bînin zimên ku pareke mezin a vegêrana kurdî, kuştin, îşkence û şewitandina gundan û hwd., ji bo xwe kiriye babeta sereke û bi jêgirtin û veguhartinên serpêhatîyên xwe yên takekesî ve jî nivîskar lê xebitîne ku tiştine ku hatine sere wan, bi rêya edebîyatê li bîra civakî bihêwirînin. Sustam, dema ku qala berhemên serdema salên 90î dike, rewşa sîyasî û patalojîk piştguh nake ya ku di teşegirtina fahma nivîskêr de kartêker e:

> Divê neyê jibîrkirin, nifşê ku wêjeya kurdî ya hemdem ava kiriye, bi şer û koça ji neçarî ava bûye û psîkolojiya kirdeya kurdên vê serdemê bi awayekî tev li hilberînê (berheman) kiriye. Loma ligel polîtîkayên zext û qedexekirinê, wêjeya kurdî bi berxwedana man û nemanê, ji vegotineke şexsî ku ji hestên sûcdarî yên hiş û binhişê rê digire, ji pîrozwerkirina wêjeyê yan jî ji mistîzmê bêhtir, ji pratagonîstê şexsî yê serwextê rewşa sîyasî sûdê werdigire ku di vegotineke kolektîf de bi cî bûye. Dibe ku ji ber vê yekê wêjeya kurdî ya di nav patalojî û trawmayê de ediliye, ne rewşeke bi qeswet e, berevajî vê, ji ber sedema fikrên ku tê de ye polîtîk e.12

### Şahidî û Berxwedana Nivîsê

Wexta ku di pêwenda Holokostê de gotin tê li ser tebeqeyên cihê yên şahidîyê, Laub, sê hêlên cihê yên şahidîyê destnîşan dike: Ya berîn di

10 Scalbert-Yücel, Clémence, *g.n.*, r. 79-80.

11 Edkins, Jenny (2003), *Trauma and the Memory of Politics.* Cambridge: Cambridge University Press, r.

12 Sustam, Engîn "Di Wêjeya Kurdî ya Modern de Trawma û Bîra Perçebûyî", wer. Zafer Atlı û Şerif Güzel, *Wêje û Rexne*, h. 4, sal:2015, rr. 124-125.

rewşa serpêhatîya trawmatîk de şahidîya kesekî ya li şexsê xwe ye, ya duyem şahidîya li govanîya kesên din e û ya sêyem jî şahidîya li pêvajoya şahidîyê (*process of witnessing*) ye.[13] Laub van rehendên navborî yên şahidîyê bi tecrûbeya jîyana xwe bi dest dixe. Têkilîya şahidîyê ya bi edebîyatê re ku piştî Holokost wekî edebîyata şahidîyê hat nasîn û her ku çû werara xwe domand, têkilîyeke xwezayî ye ku berevajî bûyerên asayî û rojane yên mirovan bi gelemperî mijarên wekî şer, pevçûn û bûyerên kavilker ji bo babeta çîroksazîya şahidîyê (*testimonial fiction*) hildibijêre. Yúdice dibêje "nivîsa şahidîyê dikare wekî vegêraneke heqîqî (*authentic narrative*) bê pênasekirin ku ji alîyê şahidekî ve tê vegêran di rewşeke zerûrî de (b.n. şer, çewisandin, şoreş û hwd.)"[14]

Şahidî di heman demê de ferqa îdeolojîk a di nav civakê de û têkilîya bindestan a bi serdestan re jî heta dereceyekê dikare kifş bike. Di jîyana civakê de dema ku xalên werçerxê ber û bîra civakê ber bi alîyekî ve dike û bitûnîya pêkhateyên civakê bi rêyên wekî şîddetê ve wêran dike yan jî diguherîne wê demê bêdengîya ku di asta takekesî û bîra civakî de teşe digire bi şahidîyê ve tê berterefkirin ku di heman demê de ev şahidî bi roleke dîroknûsî û berxwedanê jî radibe. Ji ber vê yekê ye ku edebîyata şahidîyê hevrêyê edebîyata berxwedanê ye. Çimkî şahidîkirin, ji vê alîyê ve dibe helwesteke berxwedanê li hember desthilatdarîyê.

Şahidîya li bûyera di jîyana rastîn de egera pêkhatina wê heye, pir caran dibe sebebê nîqaşên ku li ser têkilîya nivîskar û xwîner çêdibin. Alîyê vegotinê yê bîranînê û nêzîkahîya wê ya ligel jîyana rastîn dihêle ku xwîner pirsyar bike bê ka tişta ku tê derbirîn çendî rast e. Ya baş ew e ku em bo vê pirsa wan li xwîneran negirin ji ber ku ew barê giran ê çîrokên dîroka êşbêj ku bi rêya şahidîyê bi dest dikeve, didin ser milên xwe û wezîfeyeke girîng hildigirin dema ku di bîra xwe de karesata ku hatîye tecrûbekirin bi cih dikin da ku neyê jibîrkirin.

Helbet şayanê qalkirinê ye ku bîranîn û otobîyografî bo belgekirina şahidîyê û bo veguhaztina wê ya ji nifşekê bo nifşeke din dibin çavkanîyên muhim û bingehîn. Lêbelê ev yeka divê me negihîne qenaeteke giştîker di derheqê berhemên ebedî yên ku xwe bi qismî be jî bi berxwederîyê ve dispêrin şahidîya dema xwe ya bi hilweşîn û karesatan ve hatîye boyaxkirin. Di vê xalê de tişta ku Nichanian tîne zimên balkêş e. Ew

13 Caruth, Cathy (1995), *Trauma: Explorations in memory*, Johns Hopkins University Press, Baltimore and London, r. 61.

14 Yúdice, George (1996), "Testimonio and Postmodernism.", *The Real Thing: Testimonial Discourse and Latin America*, (ed.) Georg M. Gugelberger. Durham, NC: Duke UP, rr. 42-57.

dibêje divê em edebîyat û metnên wan kesên ku sax mane ne mîna belgeyekê lêbelê mîna metnekî bixwînin.[15] Wate, ew kesê ku xwîner ji nav deqê dengê wî/wê dibihîze û bi êş û kulên wî re hemhal dibe karakterê vegêranê ye ne ku nivîskarê metnê bi xwe ye. Ji ber ku em wekî xwîner dibin mihatabê vegêrê metnê. Tiştên ku vegêr di derbarê bûyereke dîrokî, tehrîbat an jî bîrhatîya xwe de qiset dike, divê di nav çarçove û dinyaya metnê de bê nirxandin û herwiha divê nivîskarê metnê nebe kirdeya sereke di nîqaşeke bi vî rengî de. Eger mirov li gotina navborî ya Nichanian vegere, di vê niqteyê de mirov dikare bibêje ku deqa nivîskarê ku şahidî kiriye bi qasî deqên din ên edebî çîroksazî ye û lewma jî nabe ku em wê ji ber naveroka wê, ku carinan rengê vegêraneke belgeyî dide, bidin ber pirs û pirsyarên rasteqînîyê.

Rast e, bi awayekî rasterast belgekirina metneke edebî wê kêşeyan derxîne. Dîsa jî hin metin hene ku vegêr bi rêya parateksê dixwaze bibêje ku di heman demê de metin ji nav rastî yan jî dîrokê ye. Pirtûka *Berbang jî Şahid e* ya A. Çeko Jiyan bi paratekseke bi vî rengî ve dest pê dike: "*Berîya çîrokê dîrok e ev a l'ber destên te*". Nivîskar xwestîye ku bibêje çîroka ku ew dihûne ji rastîya jîyanê dûr nîn e. Herwiha ji navê kitabê û parateksa navborî tê fahmkirin ku çîrok xwe dispêre rûdanên rasteqîn. Digel van paratekstan ev yeka heqê nirxandineke bergeyî nade xwînerên xwe.

Desthilatdarî, dema ku qada xwe berfireh dike û dest davêje parçekî civakê da ku wê tune bike yan jî biqurifîne, li pişt xwe nîşaneyên zilm û wêrankarîya xwe dihêle lêbelê naxwaze ku ew tiştên li pişt xwe hiştîye bên bibîranîn. Bibîranîna zilmê û ji kanîya rabirdûyê av kişandin ji hewla desthilatdarîyê re rêgirê dike ya ku desthilatdarî lê dixebite ku heqîqeta dîrokî vajî nîşan bide. Toker gotina xwe wiha dibêje di vê behsê de:

> ...dema ku em guh li şahidîya mexdûran bidêrin, textê ku dîrokê bi xêra piştgirîya ku daye bihêz û serkeftîyan bi dest xistîye, wê welgere. Tiştên ku desthilatê bi tepeserkirinê ve daye jibîrkirin wê bên bîra me û encax bi vê rêyê ve civakê bikaribe xwe ji çanda jibîrkirinê bikişîne û bide li ser rêya çanda bibîranînê. Dema ne mimkun be ku dengê kesê qurban bê bihîstin, pêwîstî ye ku em her ji ku tê bila bê, bêyî ku ti ferqê bikin navberê, li hêla ku dengê mexdûr jê tê binêrin. Dema ku derbirîna felaketê bi temamî li bêîmkanîyê asê dibe, mecbûrîyet e ku em bi israr li ser felaketê gotina xwe bibêjin.16

15 Nichanian, Marc (2011), *Edebiyat ve Felaket,* weş. İletişim, İstanbul, r. 38.

16 Göğercin Toker, Hülya, "Siyasi ve Edebi İktidara Tanıklık Edebiyatı ile Direnmek: *O Hep Aklımda", Monograf,* 2014/1, r.61-62.

**Mekanê Çîrokî, Rêzebûyer û Hêmanên Derveyî Deqê**

Pirtûka *Berbang jî Şahid e ya n*ivîskarê ciwan A. Çeko Jiyan[17] ku bûye mijara vê gotarê di sala 2014an de ji weşanên J&Jê derçûye. Çîrok, jîyan û serborîyên salên 90î yên kurdan bi nêrîna lehengên cihê ve pêşkêş dike. Bûyereke şîddetê di navenda vegêranê de cih digire di çîrokê de. Ev bûyer kuştina rojnamefiroşekî biçûk e ku kesekî rîdirêj bi satorê li stûyê wî dixe. Bûyera ku di bergehê her karakterekî de hatîye vegotin, bi qêrîna talî tê qedandin: *Allahû Ekber*. Ev hêwirzeya ku bi Allah-û Ekberê ve diqede û ber bi dawîya piranîya perçeyên çîrokê de bi çendbareyî dibe wekî tekrara herî bi bandor a çîrokê xuya dike.

Mekanê çîrokê navçeya Rezan a Dîyarbekirê ye. Piştî valakirina bi sedan gundan, bi hezaran kes ji ber zordarîya dewletê, bê rizadilî hatin li vê navçeyê bi cih bûn a ku zêdetir bi xizanîya xwe ve tê nasîn. Mekanê ku tê de şîddet rû dide, di heman demê de wekî encama kavilkirina gundan û şîddetê hatîye avakirin. Kuçeyên teng avahîyên bilind ên bêsiwax û bi hezaran malbatên xizan li Rezanê dirûnên. Şayesandinên mekanî, dayîna navên rê û parkên rastî ên bajêr tê fahmkirin ku mekanê ku hatîye sêwirandin ne mekanekî xeyalî ye. Ev yeka rasteqîna bûyerê li ber çavê xwînêr xurt dike.

Normalbûn û rojanebûna şîdetê, tesîreke çawa li ser jîyana civakê dike û bi çi rengî bûyera şîddetê dibe rewşeke temaşevanîyê bi şahidîya devkî û dîtbarî ya "serjêkirinê" ve derdikeve pêş di çîrokê de. Bûreya ku di seranserê çîrokê de, bi çavê kesekî din ve tê derbirîn û gotina bi "Allah-û Ekber"ê ya ku di tabloya jêr de deh caran li ber guhê kesên cuda dikeve, li ser jîyana lehengên cuda kartêkerîyekê mezin dike û wan ditirsîne. Ev yeka nîşan dide ku carinan bûyerên bi vî rengî di salên 90î de bi awayekî aşkera li ber çavê gel diqewimîn û gel li hember vê rewşê neçar dibû. Di heman demê de vegêrê ku hejmareke zêde ya temaşevanan peyda dike bo zilm û tadeya ku diqewime delîlan dirist dike û bi vî karî li hember gotara înkarkirinê ya desthilatê derdikeve.

Di çîrokê de hin paratekstên (sernav, pêşekî, epîgraf, berg, foto, jêrenot û hd.) ku hatine bikaranîn palpiştîyê dikin ji hêla rastî ya deqê re.

---

17 Amed Çeko Jiyan, di sala 1980yî de li Misirca Sêrtê hatîye dinyayê. Dibistana seretayî li Misircê, dibistana navîn li Sêrtê, li Îmam Hatîpê, lîseyê li Misircê xwendîye. Beşa Elektrîkê li Zanîngeha Dîcleyê û Beşa Mamostetîya Karên Metalî xwendiye. Ji ber sedemên cuda herdu zanîngeh jî kuta nekiriye. Di sala 2004an de serkêşiya derxistina fanzîna bi navê *Çirûsk*ê kiriye. Çîrok, werger û gotarên wî di kovarên cihêreng ên kurdî de çap bûne. Xêncî *Berbang jî Şahid e*, pirtûkeke wî ya kurteçîrokan a bi navê *Varjabed* (2010) jî heye. Nivîskar li Amedê dijî û karên xwe yên li ser kurdî dewam dike.

Beşeke mezin a çîrokê ji hêmanên derveyî deqê re ango ji paratekstan re hatîye veqetandin. Li gorî Genette, "[...] paratekst dihêle ku deqek bikeve dirûvê pirtûkekî û bo xwîner û ya girîngtir bo gel bê pêşkêşkirin.[18]

Eger mirov ji navê pirtûkê dest pê bike, *Berbang jî Şahid e,* mirov dibîne ku wêneyê bergê û sernavê pirtûkê bi awayekî rasterast têkilîyeke wateyî bi deqa pirtûkê re çêdike, hewl dide rastîya tiştên ku di naverokê de tê behskirin bi hevokeke hukmî bîne zimên û nîşan bide: *Berbang jî Şahid e*. Dema vegêrana çîrokê bergang e ango ber destê sibê ye. Bûyera şîddetê ya navborî ku hêmaya sereke ya vegêranê destnîşan dike ber destê sibê pêk tê û bi vî rengî berbang jî şahidîyê li bûyera navhatî re dike. Şahidîya ku bi dehan karakterên deqê dike, wekî ku ne bes be, dema çîrokê ango berbang *jî* dibe şahid. Di wêneyê bergê yê pirtûkê de, serê çend avahîyên bilind bi reşahîya ji jora wêneyî ve hatine tarîkirin û zenûnkirin, wekî ku bi vî rengî hatîye xwestin ku karesat û xirabîyên di nav bajêr de pêk hatine baştir bên temsîlkirin. Dîsa epîgrafa ku xwîner di destpêka pirtûkê de pêrgî wê tê, wekî ku li jor jî hat qalkirin, dixwaze peyamekî bide me derheqê çîroksazîya vegêranê de: "*Berîya çîrokê dîrok e ev a l'ber destên te*". Nivîskar dixwaze bibêje ev çîroka ku ez ê bo we qiset bikim, di heman demê de dîrok û serpêhatî ye jî. Di beşa naverokê ya pirtûkê de, 23 beşên binavkirî hene ku mirov dikare qedera heşt heb ji wan bike bin beşa paratekstê. Navê hin beşan wiha ne: Hêvîdaqurtîn, Azmûna Yekemîn, Hêvî, 1, ew 2, ew 3, Lerz, Jê re, Gazincek ji Çerxa Felekê, Çîroka Dehbeyê Devbixwîn û Teyrê Sîmir, Nifir.

Me sernavên ku ji yekî dest pê dike û heta 9an diçe û bi 0ê ve diqede, rêz kir. Di vê rêzkirinê de hate dîtin ku di deh beşan de jî vegêran bo şahidîyê hatîye terxankirin di tabloya li jêr de. Ango di deh beşên li jêr de karakter bi rengekî hevdemî rasterast dibin şahidê bûyerê, heşt heban de behsa Allah-û Ekberê tê kirin. Ev tesnîfa beşan jî çawa ku tê tînin bi armancekî hatîye danîn. Lûtkeya çîrokê di beşa bi navê 0ê de ye.

18 Genette, Gerard (1997), *Paratexts: Thresholds of Interpretation*, wer. Jane E. Levin, Londra: Cambridge University Press, r. 1.

| Beş | Lehengên Sereke | Kurte |
|---|---|---|
| 1. | Şengo, Dara, Tofan | Şengo şîranîfiroşekî biçûk e ku her roj ber destê sibê radibe li navçeya Rezan a Amedê şîranî difiroşe. Malbata wî ji gundekî bar kiriye û hatîye li bajêr bi cih bûye. Rojekî di xanîyekî kavil ê semta Rezan de ligel ciwanên rojnamefiroş dicive û biryar dide ku êdî bi tevî hevalan rojnameyan bifiroşe û dev ji şîranîfiroşîyê berde. Ji ber ku firotina rojnameyên kurdî yan jî kurdan qedexe û bi talûke ye, serekê ciwanan Daro rê û rêbaza belavkarîyê ji wan re salix dide û derbarê rojnamefiroşekî din ê bi navê Tofan de wiha dibêje: “Sê sal in Tofan belavkarîyê dike. Rojnameyek tenê jî nexistîye destê dijmin. Ku tu bikaribî vî karî bikî, ev kar ji firotina datlîyan hêsantir e.” (r.13)<br>Roja din Şengo yekem car bo rojnamefiroşîyê derdikeve derve û xwe digihîne cihê civînê. Dema ku nêzîkî wî cihî dide ku wî û Xî yê li wir hevdu bidîtana, pêşî dengekî xurt tê, “Allah-û Ekber” paşê jî orinîyeke wekî dengê ajalekî serjêbûyî tê bihîstin. |
| 2. | Pasdarekî dewletê, jin û keça wî | Di vê beşê de mala pasdarekî heye li tanga Koşuyoluyê. Malbat bi tevî hevdu taştê dixwin û keça wan a ku diçe dibistanê kincên xwe diguherîne. Keçika ku bi delalî hatîye mezinkirin, piştî ku xwe amade dike bi tevî bavê xwe ji qatê heftan ê avahîyê peyayê jêrê dibe. Dîya keçikê jî dertê şaneşînê da ku ji jor ve li zilamê xwe û keça xwe mêze bike. Wê kêlîyê, dengek ji qorzîya avahîya li hember tê: “Allah-û Ekber”. |
| 3. | Karkerê paqijîyê yê şare-darîyê | Karkerê paqijîyê, serê sibê qilêra li ser peyarêyan dimalîne. Di ber re jî dikeve nav mitaleyan û nîqaşa şeva borî diponije ku bi xanima xwe kiribû. Dema ku ew hê di nava xeyalan de mitrî ye, otomobîleke spî ji wir derbas dibe û dikeve sikaka paş. Peyre dengekî bilind tê: “Allah-û Ekber”. |
| 4. | Jinek | Jinek xewnekê dibîne ku tê de li asîman, di nava ewran de ye. Ji jor ve li ser sikakan difirîya ku berê lê dimeşîya. Peyre qerebalixîyeke li jêr bala wê dikişîne û dibîne ku qerebalix xelek bi xelek li dor çend kesan civîyaye. Hew dibîne ku sê mêr û jineke bi cihên reş tebelişî termekî li erdê bûne, dev û rûyê wan bi xwînê gevizîye û piştî her gezeke ku li termê li erdê dixin, diqîrin: “Allah-û Ekber”. Jinika ku piştî vê xewnê ji xew radibe ji nav nivînan vedicinique. |
| 5. | Şengul, Gulşen | Şengul xwendekarekî beşa muzîkê ye. Serê sibê dema ku radibe, dikeve nav xeyalan û keça ku jê hez dike, Gulşenê, disêwirîne. Dema ku taştêya xwe dixwe dengekî bi qêrîn dibihîze: “Allah-û Ekber”. |

| | | |
|---|---|---|
| **6.** | Jinepîr | Jineke pîr, serê sibê radibe nimêj û taetên xwe dike. Bo demekê dikeve nav mitalan, bîra gundê xwe û jîyana xwe ya berê dike. Em ji vegêranê hîn dibin ku ji ber ku nexwestine bibin cerdevan, neçar mane ku bên li Amedê bi cih bibin. Dema ku nîyeta xwe tîne ku nimêja tavê (îşraq) bike û dibêje "Allah-û Ekber", heman deng ji derve jî tê bihîstin. |
| **7.** | Aram û seydayê wî | Aram, kurikê 14 salî û sêwî, her roj diçe mizgeftê li ba seydayê xwe bo perwerdehîya dînî. Rojekî diçe mizgeftê û di dewsa seydayê xwe de bang dide. Piştî bangê û dersa xwe, bi tevî qewlika Qur'ana Pîroz dema ku diçe mala xwe dengekî bilind dibihîze: "Allah-û Ekber" |
| **8.** | Datlîfiroşê kal | Şîranîfiroşê kal, ji serê sibê ji navçeya Sûrê şîranîyên xwe hildide û ber bi Rezanê ve dikeve rê. Di rê de bi dengekî bilind dibêje "daatlîî" û şîranîyên xwe difiroşe. Di sikakekê de, seyareyek ber wî re derbas dibe û kesê ku di seyareyê de ye jê re dibêje "vegere paş û nekeve van sikakan". Piştî demeke kurt, bi dengê Allah-û Ekberê ve zinginî li sikakê dikeve. |
| **9.** | Pasdarê dewletê, jin û keça wî | Di vê beşê de, vegêr beşa 3yemîn a navborî bi bergehê keçikê ve berdewam dike. Piştî taştê keçik diçe odeya xwe da ku kincên xwe biguherîne. Peyre ew û bavê xwe ji pêlikan dadikevin xwarê lêbelê bavê wê ku dixwaze here ba jina xwe, jê re dibêje, "Rindê, hema tu îro bi Nûrşenê re here mektebê." Pey vê gotinê bavê wê vedigere malê. Dema ku keçikê derkeve derve kurikê li qorzîya avahîya li hember bala wî dikişîne. Hema wê kêlîyê, zilamekî rîdirêj xuya dibe û satora di destê xwe de dadiweşîne li ser kurikê li qorzîyê. Keçika ku ziravqetî dibe, dixwaze bibêje "bavoooo" lê nikare. |
| **0.** | Tofan | Tofanê ciwan ê rojnamefiroş, tê sikakên teng ên navçeya Rezan a Amedê ku li wir her sibe Şêrko didît. Li wir qasekî pişta xwe dide dîwêr û perçeyê dawî yê nên davêje devê xwe. Hema bi carekî re, bi dengê "Allah-û Ekber"ê ve kesekî rîdirêj satorekî li stûkura wî dixe. Rojnameyên rojek berê ji çenteyê wî belav dibin û parîyê di devî wî de jî dipeke nav xwîna ku ji stûyê wî dimizike. Li wir Tofanê nûciwan canê xwe dide. Peyre otomobîleke spî tê li ber termê wî hinekî disekine bi awirên gefxwir û peyre jî diçe. |

Di beşên cihêreng ên çîrokê de lûtkeya (*climax*) vegêranê kuştina Tofan e ku ji teref kesekî rîdirêj ve pêk tê. Bûyera lûtkeyî heta beşa bi navê o pêk nayê ji ber ku kuştî nayê zanîn. Lêbelê vegêraneke nêzîkî lûtkeyê bi hevdemî di piranîya beşên çîrokê de serdestîyê dike. Çimkî

beşên din ên çîrokê de tê dîtin an jî bihîstin ku kesek tê kuştin lêbelê vegêr nahêle ku xwîner pê haydar be heta beşa dawî ya çîrokê. Bi vî rengî, coş û peroşa vegêranê her diçe zêde dibe û xwîner bo ku bizanibe bê ka kesê kuştî kî ye, xwendina xwe dilezîne. Mirov dikare bibêje ku honaka çîrokê ne bi rêyeke klasîk pêk hatîye.

Vegêrê şexsê sêyem (*third-person narrator*) berdest e ku vegêrana derî metnê (*homodiegetic narration*) pêk tîne di çîrokê de. Çîrok li ser beşên cuda hatîye dabeşkirin. Di her beşekî de, çîroka ku tê vegêran, bin-rêzebûyereke (*subplot*) cuda dirist dike. Hin beş, di hin xalan de, hevpar in û karakterên hin beşan bi beşên din re têkildar in. Bo nimûne beşa 2. û 9. behsa heman malbatê dike. Yek ji çavê jinikê hatîye vegêran yek jî ji bergeha keça wan. Bi vî awayî, bi vegêrana çîroka kesên cuda di çîrokê de, bergehê şexsê sêyem ê têkel (*third person multiple point-of-view*) bi awayekî baş hatîye sazkirin.

Vegêr, bêyî ku navê tu tevgerekê bide, bêyî ku derbarê wan de tu agahîyên îlawe bide (jixwe hewce nake ku bi pêzanînan ve veguhêzîya dîrokê bike) qêrîna ku bi Allahû Ekberê ve li kolanê olan dide li hemû karakterên di çîrokê de bi seredorî dide guhdarîkirin. Nivîskar pûtê pê nade ku bi awayekî rasterast agahîyan derbarê vê qêrînê de bide. Çimkî vegêr wisa texmîn dike ku xwînerên wî bi rehetî dikarin bûyerên şîddetê yên di bin siwanê vê gotinê de hatine veşartin, tê derxin. Jixwe vegêr salixê qetlê bi rengekî wisa dide ku têkilîya ku wê demê di navbera JITEM û Hîzbullahê de hebû bi aşkereyî dîyar dike. Di çîrokê de, mêrikê rîdirêj ê ku bi satorê serê zarokekî dixe û erebeya spî ya ku piştî kuştinê tê cihê bûyerê kontrol dike, dîyar e ku bi hev re tevdigerin. Wate, zilamê rîdirêj ê ku qetlê pêk tîne wisa xuya dike ku endamê tevgera Hîzbûllahê ye.[19] Ji alîyê gel ve jî başebaş tê zanîn di wan salan de, wekî tevgerekê Hîzbullah jî di bûyerên şîddetê de bi cih digirt û hevkarîya wan a bi pêkhateyên paramîlîter re bûye mijara raporên Rêxistina Çavdêrîyê ya Mafê Mirovan (*Human Rights Watch*).[20] Wekî ku Çelik dema nirxandina vê çîrokê de tîne zimên, efektên ku li dû hev rêz dibin, palpiştîyê ji têkilîya di navbera Hîzbûllah û JITEMê re dike ku vê yekê di bîra

19 Par (2015) pirtûkeke piralî ya akademîk li ser Tevgera Hîzbûllahê derket. Pirtûka bi navê *Din, Şiddet ve Aidiyet Türkiye'de Hizbullah* ku ji aliyê Dr. Mehmet Kurt ve hatîye nivîsandin bo naskirina vê tevgerê dikare bibe pirtûkeke çavkanî, binêre: Mehmet Kurt, *Din, Şiddet ve Aidiyet Türkiye'de Hizbullah,* weş. İletişim, İstanbul, 2015.

20 *What is Turkey's Hizbullah?: A Human Rights Watch Backgrounder*, (Washington, D.C.: Human Rights Watch, Feb. 16, 2000).

hevpar a kurdan a derbarê salên 90î de cih girtiye.[21] Bi kurtasî, di salên 90î de îmaja ku Hîzbûllahê di bîra civakî de çêkiriye, bi şîddet, kuştin û xerabîyan ve dagirtî ye.

Di çîrokê de hem temayên civakî hem jî yên takekesî bi hev re hatine derbirîn. Herwiha, karakter hertim bi *flashback*an ve li rabirdûya xwe vedigerin û nika û rabirdûya wan di vegêranê de bi hev re cih digirin. Bi vî rengî, xwendekar, ji bergehekî berfireh bûyerê dişopîne di dema xwendina pirtûkê de. Lehengên ku di tabloyê de navên wan derbas dibin, dema pêkhatina bûyera kuştinê de di heman cih û wextî de ne xêncî beşa 4an ku tê de jinek bûyereke heman rengî lê bi awayekî xewnî dibîne. Taybetîya çîrokê ya pir-karakterî hejmara temayên çîrokê jî zêde dike. Mirov dikare temayên sereke yên çîrokê bi vî rengî rêz bike: Şewitandina gundan, îşkence, xizanî, şîddet, kuştinên bêhukim, sêwîtî, kuştina rojnamevanan, hîzbullah, bêrîkirina jîyana berê, xemxwarî û hwd.

Di çîroka pir-alî û perçeyî ya bi navê *Berbang jî Şahid e* de ji ber ku di her beşekî de vegêr çîroka kesekî cuda tîne li ser sehneyê, derfeta hisîna serborîyên mirovên ji çînên cuda yên bajêr dikeve destê xwendevên. Wekî ku me li jorê jî qal kir tê zanîn şewitandin û valakirina gundan di wan salan de diqewime. Bi sed hezaran kes ji ber ku gundê wan tê valakirin û tên koçberkirin bi tu awayî nikarin li jîyana xwe ya berê vegerin. Di jîyana nû de kesên mexdûr ji hemû nas û dostên xwe dûr dikeve, bi darê zorê debara xwe dike û pîşeyê xwe yê li gund dikaribû bikira li bajarê mezin nikare bike. Bo nimûne, di beşa 3, 6 û 8an de leheng dikevin nav mitalan û jîyana xwe ya berê ya li gund difikirin. Dîsa di paratektsa beşa bi navê “EW” de derbarê dayîkekê de wiha tê gotin:

> Ew dayîkek bû... piştî ku gundê wan hatibû şewitandin, ew jî tevî malbat û nasan li Amedê bi cî bûbû.. Mala wan li hêla semta Rezan li qeraxê balafirgehê bû. her ku dengê jetên balafirên şerî dihatê çizînî bi dilê wê diket.. Serê xwe ditewand ber xwe, û di ber xwe de digot “kezeeeeb.22

Metna çîrokê me dike bi dehan şahidîyên şerê salên 90î ku bi gotina Sustam şîddet zimanê vî şerî yê herî berbiçav bû.[23] Wekî guhdar û xwendevan em êşa mexdûran bi rêya deqê parve dikin û wan êşan bi cih dikin di bîra xwe ya takekesî de. Bi alavên dîtin, bihîstin û xwendinê ve

21 Bo vekolîna hêmaya “Torosa Spî” di edebîyata kurdî de binêre: Çelik, Adnan, “Bellek ve Savaş: Doksanların Zorla Kaybetme Fenomeni Olarak Beyaz Toros”, *Kovara Toplum ve Kuramê*, h. 10, 2015.

22 Jiyan, Amed Çeko, g.n., r. 48.

23 Sustam, Engîn *g.n.*, r.125.

şahidîya ku em bi dest dixin, tebeqeyan li deraxên hişê xwe zêde dikin û bi hevparîya hestî ya êş, derd, karesat û serpêhatîyan ve em kesayeta xwe bi hêz dikin. Şahidîya takekesî ne tenê nimûneyeke biçûk e ku bê piştguhkirin çimkî ew rê li ber me xweş dike ku em bikaribin serpêhatîya hevpar bidarizînin.[24]

**Encam**

Edebîyata kurdî, bi tevî serencama xwe ya bi zor û zehmet, bi tevî qedexeyên li ser zimanê kurdî, xwe ji tengasîyên mezin xelas kir û bi berxwedana xwe ya deqî ji xwe re cihek vekir di nav edebîyatên cihanê de. Rola bûyerên sosyo-polîtîk mezin bû li ser ên ku li Kurdistanê rû didan di vê berxwedanê de. Nivîskarên kurd, bi gelemperî li hember desthilatdarîyê ya ku hebûna wan înkar dikir, hewleke mezin dan û gotara xwe li hember desthilatdarî û hêza serdest xurt kirin. Bi vî rengî çalakîya wan a wêjeyî, ji heqîqetên jîyana wan dûr nebû û sûdwergirtina nivîskêr jî rewşa şahidîyê, çalakîya wî/wê dixist dirûvê polîtîkbûnê.

Pirtûka çîrokê ya ku bû mijara vê gotarê tenê nimûneyek bû bo vegêrana salên 90î û ji ber hêmanên din ên wekî şahidî û berxwerdanê, ji alîyê vegotinê ve başebaş li ser berhemê nehat rawestandin. Pirtûk dikare bibe mijara gotarên bi vî rengî û bi awayekî biserûber bê nirxandin. Mijara pirtûkê û awayê vegêrana wê, derfeteke berfireh daye nivîskêr da ku ew serborîyên takekesên cuda li dor bûyereke navendî qiset bike bi awayekî pêwendîdar.

Di pirtûkê de barçav e ku nivîskarê ciwan A. Çeko Jiyan, bi honaka xwe ya serkeftî wêneyekî baş ê salên 90î bo xwînerên xwe berpêş kiriye di şexsê lehengên cihêreng de. Ev yek muhim e, ji ber ku dahatûya me wê xwe bispêre rabirdûya me ku wek salên 90î bi kavilkirin û felaketan ve dagirtî ye. Sêwirandina dahatûyê, encax bi vî rengî dikare pêk bê. Eger bîra civakî bo felaket û karesatan xurt nebe û tim li rastî jibîrkirinan were, wê demê dengê kesên mexdûr wê winda bidin di bêdengîyê de. Civaka ku ji ferdan pêk tê, bi rêya çîrokên ferdan û vegêrana wan bêdengîya rabirdûya kesên mexdûr berteref dike û bi dengekî bilind çîroka hemû civakê bi me dide bihîstin.

---

24 Delikaya, Ömer, “Bîra Hevpar û Serpêhatîyeke Trawmatîk di Çinar a Mihemed Ronahî de” *Wêje û Rexne*, h. 4, sal:2015, r.178.

## ÇAVKANÎ


ALAN Remezan (2015), *Zanista Edebiyata Modern*, weş. Peywend, Stenbol.

CARUTH Cathy (1995), *Trauma: Explorations in Memory*, Johns Hopkins University Press, Baltimore and London.

ÇELİK Adnan (2015), "Bellek ve Savaş: Doksanların Zorla Kaybetme Fernomeni Olarak Beyaz Toros", *Toplum ve Kuram*, h. 10.

DELİKAYA Ömer (2015), "Bîra Hevpar û Serpêhatîyeke Trawmatîk di Çinar a Mihemed Ronahî de" *Wêje û Rexne*, h. 4.

EDKİNS Jenny(2003), *Trauma and the Memory of Politics*. Cambridge: Cambridge University Press.

GENETTE Gerard (1997), *Paratexts: Thresholds of Interpretation*, wer. Jane E. Levin. Londra: Cambridge University Press, 1997.

HARLOW Barbara (1987), *Resistance Literature*, Methuen Press, New York, 1987.

JIYAN A.Çeko (2014), *Berbang jî Şahid e*, weş. J&J.

KURT Mehmet (2015), *Din, Şiddet ve Aidiyet Türkiye'de Hizbullah,* weş. İletişim, İstanbul.

ONDATJE Michael (2011), *Anil's Ghost*, weş.Vintage, London.

NİCHANİAN Marc (2011), *Edebiyat ve Felaket,* weş. İletişim, İstanbul.

SCALBERT-YÜCEL Clémence (2014), "Paratekst û Berxwedan di Pênaseya Edebiyata Kurmancî ya li Tirkiyeyê", (amd.) Alan, Remezan & Öpengin, Ergin, *Tîr û Armanc: Gotarên Rexneyî li ser Edebiyata Kurdî ya Modern*, weş. Peywend, Stenbol.

SUSTAM Engîn (2015), "Di Wêjeya Kurdî ya Modern de Trawma û Bîra Perçebûyî", wer. Zafer Atlı û Şerif Güzel, *Wêje û Rexne*, h. 4.

ŞARMAN Mihemed (2014), "Di Çîroka Kurdî de Nivîskarî", *Wêje û Rexne*, h. 1.

TOKER Hülya Göğercin (2014), "Siyasi ve Edebi İktidara Tanıklık Edebiyatı ile Direnmek: O Hep Aklımda", *Monograf*, Sayı: 1.

YUDİCE George (1996), "Testimonio and Postmodernism.", *The Real Thing: Testimonial Discourse and Latin America*, (ed.) Georg M. Gugelberger. Durham, NC: Duke UP.

*What is Turkey's Hizbullah?: A Human Rights Watch Backgrounder*, (Washington, D.C.: Human Rights Watch, Feb. 16, 2000).